

**"Deynê Şibatê li Adarê ye":
Nihêrînek li ser Navên Mehan bi Kurdî**

Michael L. Chyet

Li nav Kurdan, du salname yên ji hev cuda hene: Sîstema Yekem, ya Gregoryanî yan mesîhî (ku bi xwe navneteweyî ye): êdî bûye pergaleke navneteweyî ku gişk ev diwazdeh meh li gorî hejmaran bîn bi nav kirin; û Sîstema Duyem, ya hetavî (ku salnameya Îranî/Farsî [Hicrî şemsî] bi xwe ye): Navên Soranî yên corbîcor hene bo wê, û navên van mehan bi farsîya Îranê cuda ne ji navên wan bi farsîya Efxanistanê. Her wisa, salnameya Îslamî [Hicrî qemerî] salnameyeke sêyem e.

SÎSTEMA YEKEM
(Mesîhî - Navneteweyî)

SÎSTEMA DUWEM
(Farsî Hetavî)

1 January	(Jan-Feb)	11 Behmen بهمن
2 February	(Feb-Mar)	12 Esfend اسفند
3 March	(Mar-Apr)	1 Ferwerdîn فروردین
4 April	(Apr-May)	2 Ordîbeheşt اردی بهشت
5 May	(May-Jun)	3 Xurdad خرداد
6 June	(Jun-Jul)	4 Tîr تیر
7 July	(Jul-Aug)	5 Murdad مرداد
8 August	(Aug-Sept)	6 Şehrîver شهر یور
9 September	(Sep-Oct)	7 Mehr مهر
10 October		

11 November	(Oct-Nov)	8 Aban آبان
12 December	(Nov-Dec)	9 Azer آذر
	(Dec-Jan)	10 Dey دی

SÎSTEMA YEKEM *Navên Kurdî*
(Mesîhî - Navneteweyî: li 1.1 [yekem roja meha yekem] dest pê dike)

1 January	Kanûna Paşîn (Kanûna Duwê) / Çilleya Paşîn
2 February	Sivat - Şubat
3 March	Adar (Avdar)
4 April	Nîsan
5 May	Gulan
6 June	Hezîran (Xezîran)
7 July	Tîrmeh / Temûz
8 August	Tebax / Ab
9 September	Îlon
10 October	Çirîya Pêşîn (Çirîya Yekê) / Cotmeh
11 November	Çirîya Paşîn (Çirîya Duwê) / Mijdar
12 December	Kanûna Pêşîn (Kanûna Yekê) / Çilleya Pêşîn

SÎSTEMA DUWEM: *Navê Farsî* *Navên Soranî*
(Farsî Hetavî: li 21.iii [roja bîst û yekem ya meha sêyem (Adarê) dest pê dike])

Bihar

(Mar-Apr)	1 Ferverdîn فروردین	Nwêroj نوپروژ / Xakelêwe خاکهلیوه
ARIES	Ĥamal حمل (Afg)	
(Apr-May)	2 Ordîbehešt اردی بهشت	Gulan گولان / Banemeṛ بانهمه‌ر
TAURUS	Ṣawr ثور (Afg)	
(May-Jun)	3 Xurdād خرداد	Cozerdan جوزەردان / Codirew جوڊیره
GEMINI	Jawzā جوزا (Afg)	/ Baranbîran بارانبیران

/ Bextebaran **بهخته‌باران**
/ Kewbedar **کهو بهدار** [Hejar]

Havîn

(Jun-Jul) CANCER	4 Tîr تیر Saraţân سرطان (Afg)	Germaciman گهر ماچمان / Pûşpeî پووشپه‌ر / Coxînan جوخینان
(Jul-Aug) LEO	5 Murdād مرداد Asad اسد (Afg)	Xermanan خهر مانان / Mîwegenan میوه‌گه‌نان / Gelawêj گه‌لاو‌یژ
(Aug-Sept) VIRGO	6 Şehrîver شهریور Sunbulah سنبله (Afg)	Berewpayîz بهر هو پاییز / Miştaxan مشتاخان

Payîz

(Sep-Oct) LIBRA	7 Mehr مهر Mîzân میزان (Afg)	Mîran میران / Geîarêzan گه‌لاریزان [Hejar] / Rêzber ره‌بهر [Karwan] / Sermawez سهر ماوه‌ز [Karwan] / Kewçerîn کهو چهرین [Hejar]
(Oct-Nov) SCORPIO	8 Aban آبان 'Aqrab عقرب (Afg)	Geîarêzan گه‌لاریزان [Ş. Qezzaz] / Serpele سهر په‌له
(Nov-Dec) SAGITTARIUS	9 Azer آذر Qaws قوس (Afg)	Agirdan ئاگردان / Sermawez سهر ماوه‌ز [G.Mukriyanî]/ Kewberdar [G. Mukriyanî]

Zivistan

(Dec-Jan) CAPRICORN	10 Dey دی Jidî ج‌دی (Afg)	Seholbendan سه‌هول‌بندان / Befranbar به‌فرانبار
(Jan-Feb) AQUARIUS	11 Behmen بهمن Dalū دلو (Afg)	Rêbendan ر‌یبه‌ندان
(Feb-Mar) PISCES	12 Esfend اسفند Hūt حوت (Afg)	Rêşemê ره‌شه‌می / Polan پولان

Li salên 1990'an, hin siyasetvan yên ku haya wan ji prensîpên

zimannasîyê tunebû, biryar daye ku êdî ew dê navên mehên salnameya "Sîstema Duwem", ango navên Soranî yê salnameya Farsî Hetavî bi kar bînin ji bona mehên salnameya "Sîstema Yekem". Bo nimûne, li şûna ku navê **Tebax**'ê ji bona meha heştem -- navekî ku hem li cem Kurdan û hem jî li cem cîranên wan yê Fileh zûda cihê xwe girtibû û belav e -- van siyasetvanan dixwest ku em peyiva **Gelawêj** bi kar bînin. Gelawêj berginda (ango berambera) meha Farsî *Murdad* مرداد e (yan *Asad* اسد bi Dariya Efxanistanê), û burca Şêr bi xwe ye, ku li 23'ê Tîrmehê dest pê dike û heta 22'yê Tebaxê dajo. Rojbûna min 2'yê Tebaxê ye, lê 2'yê Gelawêjê dibe 24'ê Tîrmehê!

Eger em qebûl bikin ku standartkirina zimên hîm û bingehê avakirina neteweyekî be, hingî kifş û aşkira dibe ku bo navên mehên salnamê, hewceya me bi sîstemeke hêsan heye, ku xelk dikare wê bê teşqeleyan bipejirîne û bi kar bîne. Berevajî, ev tevlihevkirina du salnameyan vê meselê şêlû û dijwar dike, û me dixê nav pişikê da. Ez şaş nebim, herkes li hev kiriye ku Kurd dê salnameya navneteweyî bipejirînin. Lê navên "Sîstema Duwem" çawa dikarin karê mehên "Sîstema Yekem" bibînin? Ez benî, ji bona avakirina neteweyekî, ev astengekî mezin e, li nik dilê min.

Li pêşda, bila em hinekî behsa "Sîstema Duwem" bikin. Ev yek pergalek (ango sîstemek)e -- Îranî ye, bêguman. Hem li cem Kurdan û hem jî li cem Fars û Efxanan peyda bûye. Herkes vê salnameya hetavî -- ango li gorî tav an roj (*güneş* bi tirkî, *şems* شمس bi 'erebî, *āftāb* آفتاب bi farsî) nas dike -- heta li Ewrûpa û li Emrîka jî. Erê em Ewrûpayî û Emrîkayî jî wê nas dikin, lê ne ji bona kar û barên xwe yê rojane: em wê ji "horoskop" yan burcan nas dikin. Hema hema herkes dizane burca wî yan wê çi ye. Ya min *şêr* e, bo nimûne. Li Îranê, navên Îranî yê kevn bo her mehekê hene; lê belê, li Efxanistanê, ev meh li gorî navên 'erebî yê burcan tî behs kirin. Wek mînak, me aniha behsa Gelawêjê fikir, ku Farsîya wê *Murdad* مرداد e, û li Efxanistanê wek "Asad" اسد (ango *Şêr* bi 'erebî) tî nas kirin.

Yek ji kêmasîyên van navên Soranî yê salnameya Hetavî ev e, ku jêderên din 'eynî navî (nêv) ji bona mehên ji hev cuda

datînin. Wek mînak, li gorî kovara *Karwan* ya Soranî -- meha *Sermawez* beramber bi meha Farsî *Mehr* مهر e (ango dawîya Îlonê heta nîva yekem ya Çirîya Pêşîn e, ya ku burca wê Terazî yan Mêzîn (Libra) ye). Lêbelê zimannasê bi nav û deng Gîw Mukriyanî -- *Sermawez* beramber bi meha Farsî *Āzer* آذر datîne (ango dawîya Çirîya Paşîn heta nîva yekem ya Kanûna Pêşîn e, ya ku burca wê Kevan (Sagittarius) e). Nimûneyeke din: Mam Hejar, di ferhenga xwe **Henbane Borîne** da dinivîse ku *Gelarêzan* (û ne *Sermawez*) beramber bi meha Farsî *Mehr* مهر e; lêbelê Şefîq Qez-zaz di ferhenga xwe **Şarezûr** da îdî'a dike ku *Gelarêzan* beramber bi meha Farsî *Ābān* آبان e (ango ji dawîya Çirîya Pêşîn heta nîva yekem ya Çirîya Paşîn, ya ku burca wê Dûpişk (Scorpio) ye). Ev yek bes nebe, Mam Hejar behsa meha *Kewbedar* dike, ku beramber bi meha Farsî *Xurdād* خرداد e (ango dawîya Gulanê heta nîva yekem ya Hezîranê, ya ku burca wê Cêwî (Gemini) ye; lê li gorî Gîw Mukriyanî, navê wê mehê *Kewberdar* e -- bi 2 R'yan: *Kewbe*da -- û ku ew - beramber bi meha Farsî *Āzer* آذر e (ango ji dawîya Çirîya Paşîn heta nîva Kanûna Pêşîn be): bi gotineke din, li gorî wî *Kewberdar* hevwatera *Sermawez* e.

Li dû tecrûbeyê min, Soranî-axêvên Ewrûpa û Emrîka -- mehan li gorî zimanê fermî yê welatê ku ew lê dijîn bi nav dikin. Bo nimûne, bo mehên yekem û duwem, li Emrîka û Keneda û Brî-taniya, ew dibêjin 'January' û 'February'; û li Firense dibêjin 'jan-vier' û 'février'; û her wisa li Elmanya 'Januar' û 'Februar', htd. Ev diyarde dikare bala civaknasan bikişîne bê guman, lê gelo ev sîste-meke rast û dirust dibe bo avakirina neteweyekî? Ne bi tenê ku hindêk caran ew wisa li hev tênağihin, lê ew wisa xwe li gorî biyanîyan nasnameya xwe pêname dikin.

Vêca, ev "Sîstema Duwem" -- ne bi tenê ku sîstemeke kêmnas e li nav Kurdên "Bakurî" û "Rojavayî", lê herwisa li nav Kurdên "Başûrî" û "Rojhilatî" jî, watera navên gelek mehan kêşeli-ser e. Bi dîtina min, ev sîstem nagihe pîvanên pêdivî ji bona avakirina neteweyekî. Em derbaz bine "Sîstema Yekem":

Di zargotina Kurdî da, navên mehên navneteweyî (Gregoryanî) jî hene, û zûda gotinên pêşîyan li ser her yekê ji wan jî hene. Hemî kovar û rojnameyên Kurdî yên bi nav û deng yên salên 1930'an û 1940'an jî ev navên mehan bi kar dianîn -- kovarên wek **Hawar**, **Ronahî**, û **Roja Nû**. Li nik dilê min, divêt ev kevneşopa hanê bê parastin, pejirandin, û bi kar anîn. Ez vê yekê wek dîyarîyekê dibînim -- ev sîstem/pergala hanê ji xwe li nav gel da belav e. Pêşniyara min ev e, ku em wan navan bikin standart.

Çend mînak û nimûneyên gotinên pêşîyan yên behskirî ev in:

December & January:

•[**K'anûnê û K'anûnê, berf têtê ji ezmanê** [j'ouzmané], **qîra 'ebd û însanê**] (BG) In *December* and *January*, snow falls from the sky, the ruin of all humanity [*proverbial saying*];

February:

•**Deynê Şibatê li Adarê ye** (L-1, #95, 202) *February's* debt is due in March •[**Şibat e, çi şer e û çi şewat e, xwezî nîv mehada nehata**] (BG) *February*, what struggling and what devastation, I wish there were no such month [lit. 'that it did not come among the months'] [*prv.*]

March:

•**Adar e, dew li dar e** (AB) It is *March*, *dew* [yoghurt & water] is in the wood [=wooden churner] [*prv.*] •[**Hejde bi Adarê, milyakete têtê xwarê, gazî dikete bihar e**] (BG) On *March* 18th, the angel comes down, and shouts out, "It's springtime!" [*prv.*] •**Deynê Şibatê li Adarê ye** (L-1, #95, 202) *February's* debt is due in *March*

April:

•[**Tavîya Nisanê, hêjaya malê Xuristanê**] (BG) An *April* cloudburst is worth all the riches of the universe [*proverbial saying*]

May:

•[**Heyva Gulanê, xweyî reza bi kul û kovanê**] (BG) The month of *May*, the vintner [vineyard owner] is worried and uneasy {*fearing hailstorms which could ruin the grape harvest*} [*prv.*] •**Meha gulanê, xudêyo ne de tava baranê, pezkûvî yê liber zanê** (BF)

June:

•[**Yazde bi Hezîranê, serê havînê, berê xwe bide zivistanê**] (BG) The eleventh of *June* (Julian calendar - BG), the start of summer, look toward the winter [*proverbial expression*].

July & August:

•[*Temûz û Tebaxê, agir digirite axê, dû dirabite ji şaxê*] (BG) In *July* and *August*, fire takes hold of the soil [i.e., the soil catches fire], smoke rises from the horns (of animals) [*prv.*]

September:

•[*Îlonê zik t'êrê ye, û dunya xêrê ye*] (BG) In *September* the stomach is full, and the world is [full of] goodness.

October & November:

•[*Çirîyê û Çirîyê, mal t'êr û t'ijî ye, mirov dibine xweşîyê*] (BG) In *October* and *November*, the cattle are sated and full, mankind lives pleasantly [*proverbial expression*]

Niha bi xêra çend beşdarên Kurdolojî Online, wek Mûsa Ûlfer, lîsteya van gotinên pêşîyan gelek dirêjtir bûye!

Di hûrbûna min da, navên mehan yên di kovar û rojnameyên Kurdî da, û her wisa di pirtûkên hînbûna Kurmancî da -- û kitêbên li ser rêzimana Kurmancî -- bûn mijara lêkolînê. Wek encam, min dît ku di gelemperîya van çavkanîyan da, ferqên mezin di navên mehan da tunebûn. Ji *Sibatê* (meha duwem) bigre heta ku bigihî *Îlonê* (meha nehem), varyasyon kême e. Wek mînak, di hemî jêderan da, navê meha duwem "Sibat" yan "Sebat" e -- ji bilî kovara *Hewar* (ya ku li Dimeşqê di salên 1930'an û 1940'an da çap bû), ku varyanta "Şibat" bi kar dianî. Ji bona meha çarem, "Nîsan" navê giştî bû, ji bilî pirtûkeke hînbûna Kurmancî, ku ji dêla wê ve "Avrêl" nivîsîbû. Hêjayê gotinê ye ku ji bilî navê "Tîrmehê" li şûna "Temûz" ji bona meha heftem, navên hemî mehan li gorî gotinên pêşîyan yê behskirî bi kar tên. "Tîrmeh" bi tenê nav e ku ji salnameya Farsî derbazî Kurdî bûye. Herwisa, peyiva "Gulan" ji bona meha pêncem -- bi tenê nav e ku ji salnameya Soranî ya hetavî derbazî Kurmancî bûye.

• Varyasyona herî mezin di navên çar mehên din da bû: mehên dehem (October), yanzdehem (November), diwazdehem (December) û yekem (January). Bi 'erebîya Şamê, navên mehên dehem û yanzdehem wisa ne: *Taşrîn al-Awwal* تشرين الأول û *Taşrîn al-Tānī* تشرين الثاني, ango, Teşrîna yekem û ya duwem. (Hêjayê gotinê ye ku di salnameya Îbranî da -- ango di salnameya Cihûyan da -- meha *Tişre* תשרי heye ku digel nîva duwem ya

meha nehem û nîva pêşîn ya meha dehem -- September û October -- rêk dikeve). Her wisa, her bi ‘erebîya Şamê -- navên mehên diwazdehem û yekem wisa ne: *Kānūn al-Awwal* كانون الأول û *Kānūn al-Tānī* كانون الثاني, anga Kanûna yekem û ya duwem. 'Kanûn' -- yan bi tirkî 'mangal', agirdankeke piçûk e ku li mehên zivistanê mirov xwe pê germ dike: dibe ku navê tirkî 'Ocak' ji bona meha yekem ji wir hatibe).

Ji bona mehên dehem û yanzdehem, anga October û November, bi Kurmancî peyiva *Çirî* heye, ku mirov dikare wek paralela peyiva ‘erebî *Taşrîn* bihesibîne. Di zimanê Sûryanî ya klasîk da, ew peyiv bi xwe *Teşrî[n]* e, ku navê du mehên payîzî ye: *Teşrî qadīm* yan *qdem* (anga, Teşrî ya yekem) = October, û her wisa *Teşrî 'hrāyā* (anga, Teşrî ya dawîn) = November. Di zaravayên Aramî û Sûryanî yê nûjen da, *Teşrî* bûye *Tşirî* yan *Ĉirî* -- û ji wir kete nav Kurdî da û bûye *Çirî*. Ev peyiva hanê di ferhengên Kurdî yê kevn da xuya ye: di ferhenga Jaba û Justi da [tchiriia evel] چریا اول (JJ) = October û [tchiriia pachi] چریا پاشی (JJ) = November xuya dibin. Her wisa, Ziyaeddîn Paşa jî <çirî> چـرـی = nîşan dide bi me‘naya herdu mehên October û November. Îro bi Kurmancî, em *Çirîya pêşîn* beramber bi *October* û *Çirîya paşîn* beramber bi *November* dibêjin. Ku ev navên hanê ji Filehên Sûryanî-axêv yê cîran hatin -- rastîyeke yekcar giring e. Ev yek wisa diyar dike ku ev têrmên hanê di herêma Kurdistanê da ji kevn da belav in. Ji alîyekî din ve jî, hebûna salnameyeke hevbeş di navbera Kurdên Kurmancî-axêv û Filehên Sûryanî-axêv da -- mînameke din ya têkilî û peywendîyên di navbera van her du zimanan û gelan da pêk tîne. Ev têkilî -- mijara çend lêkolînên min yê berî ye.

Em behsa xwe li ser mehên payîzê û zivistanê didomînin. Çend navên din ji bona van mehan jî hatine pêşniyar kirin. Wek mînak, ji bona meha dehem (October), peyiva *Cotmeh* heye, ku wergera navê tirkî *Ekim* e her bo vê mehê. Herwisa, ji bona meha yanzdehem (November) navê *Mijdar* hatiye dariştin -- ji mij û dûman qey. Herçê meha diwazdehem (December) û ya yekem (January), du ‘adet hene: yan *Kanûna pêşîn* û *paşîn*, yan jî *Çileyā pêşîn* û *paşîn*. Wek min berî jî gotiye, 'Kanûn' -- yan bi tirkî 'man-

gal' -- agirdankeke piçûk e ku li mehên zivistanê mirov xwe pê germ dike. *Çile* jî ji hejmara *çil* (40) tê -- ji bona çil rojên herî sar yê zivistanê. Bi 'erebîya devkî jî paraleleke wê heye: *arba 'înîyah* أربعينية (ji *arba 'în* أربعين = çil 40).

Vêca *Kanûna pêşîn* û *Çileya pêşîn* herdu bo meha diwazdehem (December) bi kar tên, û her wisa *Kanûna paşîn* û *Çileya paşîn* ji bona meha yekem bi kar tên. Balkêş e ku di salên 1930'an da, kovara Hawar -- *Çileyê pêşîn* û *Çileyê paşîn* bi kar dianî bo wan mehan, lê di salên çilan da -- her sê kovarên *Hawar*, *Ronahî*, û *Roja Nû* li şûna wan, *Kanûna pêşîn* û *Kanûna paşîn* bi kar dianîn. Di salên 1990'an da, çend pirtûkên hînbûna Kurmancî hewl da navên *Çileyê pêşîn* û *Çileyê paşîn* vejînin. Li dawîyê -- bila ez bala we liser zayenda navên mehan bikişînim: bi giştî, navên mehan bi Kurmancî mê ne, lêbelê zayenda mehên Çile tê guhartin: carinan wek mê derbaz dibin (mînak: *Çileya paşîn*) û carinan jî wek nêr (mînak: *Çileyê paşîn*). Du pirtûkên hînbûna zimên -- ku li sala 1994'an çapbûne -- pêşniyar dikin ku *Kanûn* ji bona meha diwazdehem (December) û *Çile* ji bona meha yekem (January) bên bi kar anîn (Barnas & Salzer; Öztürk).

Bibliyografya:

- AB = M. Emin Bozarslan. *Alfabe*, 2nd ed. (Borås, Sweden: Invandrarförlaget, 1980), 64 p.
- BF = Kamêran Silêman Botî. *Ferhenga Kamêran, Kurdî-Kurdî* (Duhok: Spîrêz, 2006), 775 p.
- BG = Paul Beidar. *Grammaire Kurde* (Paris: Paul Geuthner, 1926), 77 p.
- L = Roger Lescot. *Textes Kurdes* (Paris: Paul Geuthner, 1940-42) 2 vols.
- Barnas, Usso & Johanna Salzer. *Lehrbuch der Kurdischen* (Berlin: Înstîtûya Kurdî, 1994), 265 p.
- Bedirxan, Celadet (ed.), *Ronahî: supplément illustré de la revue Kurde Hawar (1942-1945)* (Uppsala: Jîna Nû, 1985), 583 p.
- Beidar, Paul. *Grammaire Kurde* (Paris: Paul Geuthner, 1926), 77 p.
- Blau, Joyce & Veysi Barak. *Manuel de kurde: Kurmanji* (Paris: L'Harmattan, 1999), 225 p.
- Hawar* (Stockholm: Nûdem, 1998), 2 vols. [complete reprint edition of the newspaper Hawar, originally appeared 1932-1943 in Syria]
- Hejar. *Henbane borîne: farhang-i Kurdî-Farsî* (Tihirân: Surûsh, 1369), 1035 p.
- Încekan, Abdullah. *Compact Kurdish - Kurmanji: Textbook with Exercises, Key and Audio-CD* (Wiesbaden: Dr. Ludwig Reichert Verlag, 2014), 276 p.

Jaba, Auguste & Ferdinand Justi. *Dictionnaire Kurde-Français* (St.-Petersbourg: Eggers et Cie, 1879), 463 p.

Kurmançî: rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmançî, hejmarên 1-20 (Paris: Institut Kurde de Paris, 1999), 439 p.

Maclean, Arthur John. *Dictionary of the Dialects of Vernacular Syriac as Spoken by the Eastern Syrians of Kurdistan, North-West Persia and the Plain of Mosul* (Oxford: Clarendon Press, 1901; reprinted: Amsterdam: Philo Press, 1972), 334 p.

Mukriyanî, Gîw. *Ferhengê Kurdistan* ([Iraqî Kurdistan], 1999), 940 p.

Öztürk, Haluk. *Peyvên me* (Bromma, Sweden: Roja Nû, 1994), 66 p.

Payne Smith, J. *A Compendious Syriac Dictionary Founded Upon the Thesaurus Syriacus of R. Payne Smith* (Oxford: The Clarendon Press, 1990 [1903]), 623 p.

Qazzaz, Shafiq. *The Sharezoor = Ferhengê Şarezûr* (Erbil, Kurdistan: Aras, 2000), 601 p.

Rizgar, Baran. *Learn Kurdish: A Multi-Level Course in Kurmanji* (London : Lithosphere, 1996), 299 p.

Roja Nû: Rojname Siyasî ya hefteyî (1943-1946) (Uppsala: Weşanên Jîna Nû, 1986), [73 issues]

Thackston, W. M. *Kurdî Bê Firmêsk = Kurdish Without Tears* (Cambridge, MA : Harvard University, Dept of Near Eastern Languages and Civilizations, 1997), 48, 12 p.

Yusuf Ziyaeddin Pasa. *al-Hadîyah al-Ĥamîdîyah* (Beirut, 1975), 56, 240 p. = Mohammad Mokri. *Recherches de Kurdologie: Dictionnaire Kurde-Arabe de Dia' Ad-Din Pacha al-Khalidi: introduction et notes linguistiques, notice sur la phonétique et la graphie arabo-persane du dialecte kurmandji, Textes et étude religieux, linguistiques et ethnographiques* (Langues et civilisation iraniennes), no. 4 (Beyrouth & Paris, 1975).

Sermawez = *Mehr* (Sept/Oct, zodiac sign Libra): Sorani journal *Karwan*
= *Āzer* (Nov/Dec, zodiac sign Sagittarius): Gîw Mukriyanî

Gelarêzan = *Mehr* (Sept/Oct, zodiac sign Libra): Mam Hejar (= *Sermawez*)
= *Ābān* (Oct/Nov, zodiac sign Scorpio): Şefîq Qezzaz

Kewbedar = *Xurdād* (May/June, zodiac sign Gemini): Mam Hejar
Kewberdar = *Āzer* (Nov/Dec, zodiac sign Sagittarius): Gîw Mukriyanî (= *Sermawez*)